Pirs : Çi peywendiyên te bi dengbêjên kurd re hene?

Bersiv : Bi hemiyn re hene, û ez dixwazim tim yekîtiya wan hebe .

Pirs : Weke kî ?.

Bersiv : Nûlîfer Iqbal bimin re wek duwîto çêkir , min bi kurmancî û wê bi zazakî stirand .Herweha min û Heqî Segvan di /91/ ê de dema koçberiya kurdên kurdistana başûr .

Pirs : Stiran û awazên te gelo tu datînî yan hin hene arîkariya te dikin?

Bersiv : Hene arîkariya min dikin , wek Ebbas Ehmed – peywan Arjîn – Heqî Segvan .

Pirs : Di nav van rewşên em têde derbas dibin, tu stirana kurdî û paşeroja wê çawa dibînî? .

Bersiv : Di demekê de, me guh nedida gotinê , tenê me dixwest em bistirînin, lê îro em xweşik guh didine naveroka van gotinan , ji ber wilo jî ez dibînim stirana kurdî bi pêşve diçe û wê pêşve here . ji ber ku kurd guh didine hunerê. Li Ewropa Kurdin hene pera didin ji bo dengê keça xwe bidne qebûlkirin , ew jî guh didin mûzîkê .

Pirs : Tu çawa satelaytên kurdî dibînî, û rola wan di pêşxistina huner û filoklora kurdî de?.

Bersiv : Dem dema propagandyê ye û rola wan gelekî pêwîste di belavkirina koltûra kurdî de .

Pirs : Dibêjin mûzîka kurdî bi dayikê re tê, tu çawa dibînî? .

Bersiv : Erê raste , ji ber kurd bûne û derd bi wan re ye, û bi zîqezîqa dergûşê re, dayika kurd gelek derdê xwe vala dike .

Pirs : Bandora kê ji dengbêjê kurd li te heye? .

Bersiv : Ya tevan li min heye . Şivan – Mihemed Şêxo – Hesen Cezrawî ,. her yek ji wan bi rengekî

Pirs : kî ji wan nêzîkî dilê te ye .

Bersêv : Şivan, ewî kehreba kurda ya vemirtî pêxist û gavek mezin da .

Pirs : Mûzîk û sazên biyanî ta bi çi radeyê bandora wê li te heye? .

Bersiv : Ji berê de min li xulyo îliya guhdarî dikir û niha ez guhdariya / cikoka / dikim ew jî dengbêjekî Inglîzî ye, Rok distirêne .

Pirs : Nifşên nû ji dengbêjên kurd . tu çi ji wanre di bêjî :

Bersiv : Mûzîk sînor jêre nîne bi çi awayî tu bibîne baş e, gerek tu lêdî . eger baş be wê pêşkeve . gereke mirov ji tiştên nû netirse .

Pirs : Hunermendê paşerojê tu kê dibînî :

Bersiv : Ez nikarim kesî binav bikim . yê baş ewê her tim li pêş be.

Pirs : Gelek stiranên te navê cî û deverên welêt têde hene . ta bi çi radey bandora welêt li te heye .

Bersiv : Ez têr nabim gava li ser millet û welêt nebêjim . ez tim dibêjim: em masiyê bejê ne ,em li wirin lê hiş û ramana me li vir e , em tu carî van cî û deveran jibîr nakin , çimkî ew dîroka me ye .

Pirs : Bi yek gotinê li ser van dengbêjan bi axive .

Şivan : Hunermend û şoreşgêre .

Mihemed Şêxo : dibistane .

Aram Dîgran : kalkê hunermenda ye .

Gulîstan : ewê karîbû perdê ji pêşiya keça kurd hilên .

Ciwan Haco : li berxwedan û stirana nû bire serî .

Pirs : Eger tu ne hunermend bane tê çi ba?

Bersêv : Ezî şoreşger bama .

Pirs : Berî dawî, rûpela Newrozê ji te re ye, tê çi bêjî ? **D.R (11)**